

TAKAMUL IV

**Peredayîna ji bo Bihêzkirin û Xurtkirina Civaka Sivîl a Sûrîyayî
û Piştgirî Hevgirtina Civakî**

Bangewaziya Pêşniyaran û Belgeya Rêberîyê

Projeya BRIDGE "Xurtkirina Karînên Civaka Sivîl a Sûrîyayî" ku ji aliyê Wezareta Hevkariya Aborî û Geşepêdanê ya Federal a Almanyayê (BMZ) ve tê finansekirin û ji aliyê "Deutsche Gesellschaft für Internationale Zusammenarbeit" (GIZ) GmbH ve tê pêkanîn, daxwaza pêşniyarên piştgirîya Rêxistinên Civaka Sivîl a Sûrîyayî (CSO) dike.

Di çarçoveya projeya GIZ, BRIDGE de, Fona TAKAMUL IV Bangewazîya Pêşniyaran dide destpêkirin, û rêxistinên civaka sivîl li Almanyayê (ku di çarçoveya Sûrîyayê de dixebitin) û rêxistinên civaka sivîl ên li hundirê Sûrîyayê vedixwîne ku pêşniyarên projeyên hevbeş pêşkêş bikin. Armanca bangewazîyê piştgirîya projeyên ku **hevgirtina civakî xurt dikin, tevlêbûna civakê ya berfireh pêş dixin, û rola civaka sivîl a Sûrîyayê di vejîna herêmî û berxwedana civakê de zêde dikin**. Rêxistinên pêwendîdar vexwendî ne ku li gorî şertên di vê belgeya rêbernameyê de hatine destnîşankirin serlêdan bikin.

A. Pênasîn

- I. **TAKAMUL** : Fonek ji alîyê GIZ ve di bin projeya BRIDGE de tê birêvebirin, ku ji bo xurtkirina civaka sivîl a Sûrîyayî li hundir û derveyî Sûrîyê û piştgirîya hevgirtina civakî hatiye terxankirin. Navê wê bi Erebiyê tê wateya "entegrasyon", armanca Fonê nişan dide ku hevkarîya di navbera rêxistinên civaka sivîl ên Sûrîyayî li hundirê Sûrîyayê û rêxistinên dîasporayê de zêde bike.
- II. **Projeya BRIDGE** : Projeyek GIZê ye ku ji hêla BMZ ve hatiye erkdarkirin da ku karîn, bandor û berxwedana aktor û rêxistinên civaka sivîl ên ku di çarçoveya Sûrîyayê de dixebitin xurt bike.
- III. **Rêbaza Hevbeş**: Modelek projeyan a pêwîst e, li ser bingeha hevkarîya hevbeş di navbera rêxistineke civaka sivîl a dîasporayê ya li Almanyayê ku di çarçoveya Sûrîyayê de dixebite (serlêderê sereke) û rêxistineke civaka sivîl a herêmî ya Sûrîyayî (hevserlêder). Ev rêbaz avakirina projeya hevbeş, plansaziya hevbeş, hevrêzkirin û pêkanîna hevbeş li hundurê Sûrîyê misoger dike.
- IV. **Rêxistina Dîasporayê / Serlêderê Sereke**: Rêxistineke bi awayekî qanûnî li Almanyayê qeydkirî ye ku erka wê têkilîya bi civak an pirsgerêkên Sûrîyayê re ye. Wekî serlêderê sereke, ew berpirsiyarîya peymanî û darayî ya projeya pêşniyarkirî hildigire ser xwe, serlêdanê pêşkêş dike, raporê birêve dibe, û pabendbûna bi hemî pêdiviyên bexşeran re misoger dike.
- V. **Rêxistina Sûrîyayî ya Herêmî / Hevserlêder**: Rêxistineke Nehikûmî ya Herêmî ye ku bi qanûnî li Sûrîyayê qeydkirî ye. Wekî hevserlêder, ew bicihanîna çalakîyên projeyê li hundirê Sûrîyayê û pêkanîna plana xebatê ya pejirandî digire ser xwe û pereyên bexşê yê ji serlêderê sereke hatî şandin werdigire.
- VI. **Hevgirtina Civakî**: Şîyana takekes û koman di nav civatekê de ji bo parastina têkilîyên avaker, avakirina bawerî û rêzgirtina hevbeş, hevkarîyê li ser hizrên hevpar, û aştîyane li seranserê civakên pirreng, etnîkî, olî, an yê din.
- VII. **Detpêşxwerîya Navxweyî**: Çalakîyeke bi pêşengiya civakê ku ji hêla sûdmendên projeyê ve tê pêşniyarkirin û bi pêşxistina bawerî, hevkarî, diyalog û beşdarîya civakê, bi taybetî balkişandina ser beşdarîya watedar û tevlêbûna jin û ciwanan, hevgirtina civakî û jiyana aştîyane li seranserê civakên cuda di warê, etnîkî û olî xurt dike.
- VIII. **Ciwan (Di bin TAKAMUL IV de)**: Kesên, hem mêr û hem jî jin, di navbera 18 û 27 salî de.

B. Paşxane: Projeya GIZ BRIDGE û Fona TAKAMUL IV

Projeya GIZ BRIDGE "Xurtkirina Karînen Civaka Sivîl a Sûrîyayî" aktor û rêxistinên civaka sivîl li hundir û derveyî Sûrîyeyê bihêz dike. Wekî amûrek destwerdanê ya projeya GIZ BRIDGE, fona TAKAMUL karînen Rêxistinn Civaka Sivîl yên Sûrîyayî ji bo avakirina hevgirtina civakî li seranserî civakên etnîkî û olî xurt dike, bi vî rengî bawerî, hevkarî û tevlebûnê di nav civakên herêmî yên cihêreng de pêş dixê.

Taybetmendîyeke diyarker a TAKAMUL IV **Nêzîkatîya Hevbeş e**, ku hevkarîyeke nêzîk di navbera rêxistinên dîyasporayê yên Sûrîyayî yên li **Almanyayê qeydkirî** û rêxistinên civaka sivîl ên herêmî yên li hundirê **Sûrîyayê de, pêş dixê**. Armanca vê modelê ew e ku hevkarî û danûstandinê di navbera aktorên civaka sivîl ên Sûrîyayî yên li hundir û derveyî welêt de xurt bike, di heman demê de ji kapasîteyên wan ên temamker, perspektîf û zanîna wan a kontekstî sûd werbigire. Bi rêya sêwirana projeyên hevbeş, biryardan, hevrêzîkirin, danûstandina zanîne û pêkanîne, Nêzîkatîya Hevbeş hewl dide ku hevkarîyên watedar û domdar di navbera rêxistinên dîyasporayê û herêmî de ava bike û piştgirîya beşdariyên bêtir li ser bingeha herêmî ji bo hevgirtina civakî û berxwedana civakê bike.

C. TAKAMUL IV – Nêzîkatîya Bernameyî

TAKAMUL IV hewl dide ku bi rêya çar aliyên ku hevdu xurt dîkin, beşdarî hevgirtina civakî bibe: **bawerîya di navbera civakan de, bawerîya dewlet-civakê, bernamekirina hestiyar a li hember pevçûnan, û beşdarîya giştî**. Divê hemî pêşniyar nîşan bidin ka destwerdana pêşniyarkirî çawa beşdarî her yek ji van aliyên dibe, di heman demê de divê were zanîn ku cewher û asta beşdarîyê dikare li gorî çarçove û armancên projeyê biguhere. Ev alî bi hev ve girêdayî ne û ji ber vê yekê divê di desayna giştî ya projeyê de werin nîşandan, ne ku wekî pêkhatyên cuda an serbixwe werin hesibandin.

- 1. Bawerîya di navbera civakan de** : Xurtkirina bawerî, têgihîştina hevbeş û pêşxistina çandeke hevkarîyê li nav civakên pirrind di warê, etnîkî, olî û civakî de, di nav de di navbera civakên mêvandar, koçber û yên vegehiyayî de, li cihên têkildar.
- 2. Bawerîya dewlet-civakê** : Xurtkirina têkilîya avaker û hevkarîya di navbera civaka sivîl, civakan û rayedarên herêmî yên têkildar de der bare hizrên hevpar de û biryardana herêmî.

3. Bernamekirina hestyar li hember pevçûnan : Piştrastkirina ku destwerdan bi analîza pevçûnan, prensîbên Ne-Ziyanrêkirin û çavdêriya berdewam a çarçove, tengazarî û bandorên nexwestî, û bi adaptekirinê li cihê ku pêwîst be, têne agahdarkirin.

4. Beşdariya Tevlîhev : Misogerkirina beşdariyeke watedar di jiyana civakî û biryardanê de, bi taybetî balkişandina ser jin, ciwan, kesên astengdar û komên din ên ku bi astengiyên beşdarbûnê re rû bi rû ne. Armanca vê yekê xurtkirina tevlêbûna wan a sîvîl û danîna wan wekî rêberên civakê û aktorên çalak ên guhertinê ye, di nav de bi rêya pêkanîna Înîsiyatîfên Herêmî.

Tedbîrên bi tenê mirovî û yên ji bo ji nû ve avakirina binesaziyê **nayên** fînansekirin.

D. Pîvanên Şert û Mercên

Ji bo ku ji bo nixandina bêtir mafdar be, divê her pêşniyar bi tevahî şertên jêrîn ên mafdariyê bicîh bîne:

- Nêzîkatiya Hevbeş bi awayekî zelal nîşan bide, ango pêşkêşîyeke hevbeş ji aliyê rêxistineke dîasporayê ve ku li Almanyayê wekî serlêder û wergirê sereke yê alîkarîyê qeydkirî ye û rêxistineke nehikûmî ya li Sûrîyayê wekî hevserlêderm berpîrsîyarê pêkanîna li hundirê Sûrîyayê.
- Divê her du namzet bi fermî qeydkirî bin.
- Pêdivî ye ku hemî belgeyên pêwîst bi zimanê Îngilîzî werin pêşkêşkirin.
- Divê kaxezên fermî bê guhertin werin bikaranîn.
- Divê pêşniyar bêkêmasî û rastgo be.
- Divê budceya pêşniyarkirî di nav sînore budceyê yê diyarkirî de bimîne.
- Divê hemû çalakiyên projeyê li hundirê Sûrîyayê werin bicihanîn.

E. Pîvanên Pêş-Hilbijartinê

Pêşniyarên ku bi serkeftî ji nixandina mafdariyê derbas dibin, dê li gorî çend pîvanên sereke werin nixandin. **Pêşîn**, pêşniyar divê bi **nêzîkatiya bernameyî ya TAKAMUL IV re li hev bikin**, çalakîyên berfireh ên **ku li seranserê cudahiya civakî, etnikî û olî têne bicîh kirin**, bi baldarî li ser **jin û ciwanan**, û beşdarîya temamker a **kesên astengdar**, li cihê ku têkildar be, bi zelalî nîşan bidin. **Ya duyemîn**, **pêşniyar beşdarîya ji bo hevgirtina civakî divê pêbawerkirî be**, nîşan bide ka destwerdan çawa dê têkilî, bawerî û hevkarîyê di asta civakê de xurt bike. **Sêyemîn**, **pêşniyar dê ji bo girîngiya wan werin**

nirxandin, piştrast bikin ku pirsgrîk baş hatiye destnîşankirin, li gorî hewcedariyên herêmî ye, û çalakîyên pêşniyarkirî bi awayekî guncaw bersivê didin pêşîniyên civakê û astengîyên çarçoveyê. **Çaremîn, nûjenîya** projeyê dê were nirxandin, bi lêkolîna ka ew nêzîkatîyek nû dide nasîn an jî rêbazek heyî bi awayekî rastîn û guncaw diguhezîne. **Pêncemîn, Awayê destwerdanê** divê armancên rastîn û pêkan, encamên hevgirtî, û planeke pêkanîne ya pratîkî û gengaz pêşkêş bike ku bi Demeke pêkanîne ya zelal ve piştgirîkirî be. **Şeşemîn, pêşniyar divê rêveberîya metirsîyê ya xurt û nêzîkatîyên hestiyar ên pevçûnê, yên Ne-Ziyankirinê** nîşan bidin . Serlêder divê nîşan bidin ka analîza wan a çarçoveya herêmî, di nav de tengezarîyên têkildar, dabeşbûn, dînamîkên hêzê û rîskên potansiyel, çawa bandor li şewazê destwerdanê kiriye, di nav de armanc, komên hedef, çalakî û nêzîkatîya pêkanîne. Pêşniyar divê bandorên pêkan ên nexwestî jî destnîşan bikin û tedbîrên kêmkirinê û çareserkirinê yên guncaw peyda bikin. **Di dawîyê de,** pêşniyar dê ji bo **domdariya** wan û pêkana wan a çêkirina bandorên mayînde li dû serdema projeyê werin nirxandin, di nav de bi rêya têkilîyên xurtkirî, karîn, tor, mekanîzmayên civakî an pratîkan, û her weha derfetên ji bo dubarekirin, adaptekirin, an berdewamîyê li cihê ku guncaw be.

F. Pêdiviyên Budceyê û Nirx-Kêrhatinê

Serlêder dikarin ji bo piştgiriya darayî li gorî yek ji du bijardeyên jêrîn serlêdan bikin:

- **Heta 50,000 EUR:** Ji bo projeyên ku ji hêla rêxistinên dîasporayê yên Sûrîyayî li Almaniya ve tene rêvebirin û di rêvebirina fonên giştî de xwedî ezmûnek sînorkirî ne. Divê ev proje bi rêxistinek hevkar a civaka sîvîl li Sûrîyayî re hevkarîyê bikin û dikarin heta 50,000 EUR bi dirêjahiya projeyê şeş mehan werbigirin.
- **Heta 100,000 EUR:** Baştir e ji wan projeyan re tê dayîn ku serlêderên sereke yên ji dîasporaya Sûrîyayê ya li Almaniya xwedî ezmûna birêvebirina fonên giştî ne û bi bêtirî yek rêxistina hevkar a herêmî ya ji civaka sîvîl li Sûrîzyê re hevkarîyê dikin. Projeyên weha dikarin heta 100,000 EUR fînanse werbigirin û heyama projeyê heşt mehan be .

Herî kêr %70ê tevahiya fonê ji bo hev-serlêder(ên) li hundirê Sûrîyayê were veguhestin, ku balê bikişîne ser bicîhanîna herêmî ya projeyê. Serlêderê sereke nikare di budceya xwe de ti çalakîyên bicîhanîna projeyê bihewîne. Mesrefên îdarî dikarin ji bo serlêderê sereke bigihêjin %7 û ji bo hev-serlêderê Sûrîyayê jî bigihêjin %2 .

Hin cureyên nirxan, wek **nirxên avakirinê an nirxên karmendan ên ku rasterast bi pêkanîne ve ne girêdayî ne, ji bo peredayîne ne mafdar in.**

Herwiha, hem serlêderê sereke û hem jî hev-serlêder divê di nav heman kaxezên fermî budceyê de **di pelên cuda de ravekirinên vegotinî jî tê de bikin. Divê ev ravekirin armanc û taybetmendiyên** her xeta budceyê destnîşan bikin.

G. Tedbîrên Pabendbûn û Lêkolîna Berdewam

Piştî qonaxa pêş-hilbijartinê, divê hemî serlêderên ku di lîsteya bjarkirî ya kurt de ne, berî peymankirinê, tedbîrên pabendbûn û lêkolîna pêwîst derbas bikin. Di vê qonaxê de, dibe ku ji serlêderan were xwestin ku zelalkirinan bidin, belgeyên nûvekirî pêşkêş bikin, an jî bersiva daxwazên sererastkirinê bidin. Wekî beşek ji van tedbîran, hemî rêxistinên pêş-hilbijartî dê ji **pêvajoyek nirxandina giştî** û her weha **kontrolkirina mafdariya bazirganî û qanûnî derbas bibin** da ku pergalên rêveberîya darayî, kontrolên navxweyî û karînen kêmkirina rîskê binirxînin. **Tenê serlêderên ku tedbîran derbas dikin dikarin ji hêla GIZ ve bi peyman werin girêdan.**

GIRÎNG: Ji **serlêderê sereke** tê xwestin ku **sertîfîkayek efûya ji bacê ya derbasdar pêşkêş bike**, û ev belge **divê dema ku were xwestin amade û berdest be** .

H. Dema Pêşbînîkirî

Rojek	Çalakî
7 û 12ê Cotmeha 2026an	Danişînên agahdarîyê yên TAKAMUL ji bo hemî serlêderên eleqedar
8ê Mijdara 2026an	Demê dawî ji bo pêşkêşkirina pêşniyarên projeyan
Mijdara 2026an	Pêvajoya pêş-hilbijartinê
Kanûna Pêşîn a 2026an - Adara 2027an	Kontrolên lihevhatinê, zelalkirin û sererastkirinên dawî
Adar-Nîsan 2027	Agahdarî ji bo serlêderên ku di dawîyê de hatine hilbijartin hatine şandin û destpêkirina pêkanîna projeyê

I. Rêbernameyên Serlêdanê û Pêdiviyên Pêşkêşkirinê

Divê hemû serlêder dema amadekirin û pêşkêşkirina pêşniyarên xwe li gorî rêbernameyên jêrîn tevbigerin. **Her TANDEM (Rêxistinên xwedî karên hevbeş) dikare tenê yek pêşniyar pêşkêş bike**, û ti rêxistinek nikare di zêdetirî yek serlêdanê de beşdar bibe. Serlêderê sereke dikare bi rêxistinên hevkar ên civaka sivîl ên li Sûrîyayê re hevkarîyekê ava bike, ku hejmara hevkar, sînorê peredayîna têkildar, û dema projeyê li gorî vebijarka pereyan bijartî ye. Serlêdanên heta **50,000 EUR** divê ji bo **şêş mehan rêxistinek hevkar di nav xwe de bigire**, lê serlêdanên heta **100,000 EUR** divê ji bo **heşt mehan** ji yek rêxistina hevkar a herêmî zêdetir di nav xwe de bigire û pêdivî bi ezmûna îsbatkirî di rêvebirina fonên giştî de hebe.

Di hemû rewşan de, hevkarîya pêşniyarkirî divê nirxek bernameyî ya zelal li destwerdanê zêde bike. Pêşniyarên ku gelek hevserlêderan dihevin divê rol û berpirsiyarîyên her rêxistinekê bi zelalî destnîşan bikin û hevkarîyek watedar di avakirina projeyê, biryardan, hevrêzkirin û pêkanîna de misoger bikin. **Serlêderê sereke rêberê peymanî û darayî yê projeyê dimîne.**

Pakêtek serlêdanê ya temam divê pêşniyara projeyê, budce, û belgeyên qeydkirina yasayî yên hem serlêderê sereke û hem jî hev-serlêder(an) di nav xwe de bigire.

Ji serlêderan tê xwestin ku **kaxezên fermî** ji bo pêşniyara projeyê û budceyê bikar bînin. Ev kaxez dikarin rasterast ji vê malperê werin dakêşandin: <https://www.neuanfang-syrien.de/en> an jî bi rêya e-nameyê ji takamul@giz.de re bi mijara **"kaxezên serlêdana TAKAMUL"** werin xwestin.

Pirs û lêpîrsînên di derbarê Bangewazîya Pêşniyarê de divê bi rêya lînkê jêrîn werin şandin: <https://kobo-ee.giz.de/x/dCZdBCJ6>. Bersiv dê di dema rûniştinên agahdariyê de werin parvekirin û di belgeyêke Pirs û Bersivê de ku ji bo raya giştî gihîştî be werin berhevkirin.

8ê Mijdara 2026an werin wergirtin û **bi taybetî bi rêya e-nameyê ji takamul@giz.de re** werin şandin, bi mijara **"Şandina Pêşniyara TAKAMUL"**. Tenê serlêdanên ku heta **roja dawî, saet 23:59 (dema Şamê)** werin wergirtin, dê werin nixandîn.

Hemû daneyên serlêder dê li gorî **standardên parastina daneyan bi ewlehî werin pêvajoyê kirin û hilanîn**.

- **GIZ mafê xwe diparêze ku di her kêliyê de bangewaziyê biguherîne, paş ve bixe, an betal bike û dibe ku serlêdanan red bike.**
- **Serlêdanên ku ne bi îngilîzî bin, an jî belgeyên pêwîst kêmkirî bin dê neyên nirxandin.**
- **TAKAMUL li portfoliyoyekê digere ku cihêrengiya çarçoveyên Sûrîyayî nîşan bide û dibe ku dema hilbijartina projeyan cihêrengiya erdnîgarî û çarçoveyî li ber çavan bigire.**

Serkeftin bo hemû serlêderan, û em li bendê ne ku pêşniyarên baş-pêşkeftî werbigirin ku têgihîştinên nûjen nîşan bidin û beşdarî guhertinên erênî li Sûrîyayê bibin.